Nweroza Laziqiyê

*- Rikxirawa partiya me (P.Y.D.Ks) tevle hin xwendekarên Kurd li wir û di gel hin hevalên T.K û bi alîkariya tîpa Perwer ya folklorî, hunermend Ciwan , Newroz, Şêrkan ji Efrînê û hunermend Husên Îbrahîm ji Dêrîkê , cejna xwe ya netewî NEWROZ vejandin.

Bi beşdariyek balkêş ji aliyê malbatên Kurd ve yên ku, li Lazîqiyê dijin – mirov dikare bibêje ku, hejmara beşdaran 700 kes derbaskir – şahiya cejna NEWROZê di sîng û hembêza siruşta rengîn de, bi kêf û xweşî hate borandin .

Şahiyê bi kêlîkek bêdeng, li ser giyana pakrewanên Kurdistanê , 12 î Avdarê û pakrewanê NEWROZê Silêman Adî destpêkir û piştre sirûda netewî û gotina NEWROZê hate xwendin .

Xwedekarên Kurd jî, bi pişkdariya xwe yên tekane ev bûyer zengîn kirin .Wan bi kêf û xweşî beşdar vegeriyan malên xwe, ji xwedê xwestin ku, NEWROZ di salên dî de jî, bi xêr û aştî di ser mer re derbas bibe.

Du waneyên balkîş

- Komîta çandeyî ya P.Y..D.Ks li Laziqiyê di çarçewa pirograma xwe ya çandeyî de, di dawiya heyva Avdarê de, waneyek di bin navnîşan (Kurd di sedsala 19an de) li darxist . Wanevan di waneya xwe de, hemî bûyer û serpêhatiyên di vî sedsalî de qewimîne û bi taybetî jî şoreşên Kurdî anîne zimên .

Lê, hêja ye ji bîr nebe jî ku, rola beşdaran di zengînkirina waneyê de berçav bû. Li dawiyê sipaskirina wan ji wanevanê xwe re, li ser ked, zar û zimanê wî di ber amedekirina wê waneyê de ciyê rêzgirtinê bû.

*- Careke din, wê komîta çandeyî waneyek di bin navnîşana " Împeretoriya Midiya " de, pêşkêşkir. Waneger di waneye xwe de, dîroka Împeretariya Mîddiya (destpêka avakirinê, şaristaniya wê û cîranan) anî zimên . Zengînbûna waneyê bala beşdaran ber xwe kişand.

Kurte Nûçe

*- Li gundê Curqa , çiyayê Bilêl , Raco , termê Husên Bekir kurê Umer , xortê 22 salî tê dîtin . Bê yî ku, bê zanîn , çawa û kê kuştiye . Xwedê sebrekê bide xwediyên wî .

*- Dîsa li gundê Curqa , li Reco , bav û kur û keça wî , bi destê cîranên xwe têne kuştin .

*- Li Kobaniyê jî , bavek(Hemê Şewket) herdu lawên xwe qurşîn dike . Di encam de, yek dimre û yek birîndar dibe .Ax nezaniyê tu bûye sedema rêtina çiqas xwîn û hê tê çiqasî dî jî birêjî.

Xebakar Hecî Heso jî barkir

Xebatkar Hecê Hiso, ji gundê Çelebiyê herêma Kobaiyê, ji destpêka şêstiyan ve, derbasî nav tevgera Kurd dibe .Bi dil û can xebata xwe ya Kurdperwerî bedewam dike . Di nav gundiyan de, bi qedir û qîmet bû. Di 14/4/2006 an de, diç ser dilovaniya xwedê û bi beşdariya gundî, dost û hevalîn tevgera Kurdê di goristana gund e tê veşartin